*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd*
*di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Gişti Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

Hejmar (530)
2026-11-21

www.agirimedia.org




**DI VÊ HEJMARÊ DE:**

Daxuyaniya PDKI ..... 2
Rojev ..... 7
Hevpeyvîn ..... 8
Civakî .....10
Mafê Mirov ..... 11
Poster..... 12

# Yad û rêbaza wan namire



Di xezelwera 1398an de, ji şeqam û çaylax û neyzaran, heta qadên serhildanê li seranserî bajar û herêmên cuda cuda yên seranserî Îranê, her ji Seqiz û bokan û Sine û Ciwanroya Rojhilatê Kurdistanê, heta Ber derê Mizgefta Zahidanê, ji Ehwaz û Mahşehra başûr ve heta Kerec û Reşd û Gîlanê, xort û keçên azadîxwaz dengê xwe li dijî zordarî, bêdadî û cudakariyê bilind kirin. Ew xortên ku bi destên vala û bi îradeyeke mezin li hemberî gule û çekên giran rawestiyan, bûn sembola berxwedanê.

Rêjîma Îranê xwest bi tundî û kuştinê vî dengî mat bike û wan gernasan ji me bistîne, lê nekarî hêviya azadiyê di dilê gel de bikuje.

Ev xwîna geş û ev berxwedana mezin paşê di şoreşa Jînayê de jî wekî çirayekê rêya nifşên nû ronî kir. Di her du serhildanan de jî, armanc yek bû, jiyaneke bi rûmet, dadperwerî û azadî. Her çend gelek ji wan xort û keçên qehreman ji nav me hatin birin û cihê wan di nav malbat û hevalên wan de vala ma, lê xewn û daxwazên wan di nava civakê de zindî man.

Rêjîm dikare canê mirovan bistîne, lê nikare bîranîn, çîrok û rêbaza wan ji nav bibe. Her carê ku navê şehîdên xezelwerê û şoreşa Jînayê tê anîn, rihê berxwedanê ji nû ve şîn dibe. Bi bîranîna berdewam, bi vegotina rastiyan û bi parastina nirxên wan, em rê nadin ku xwîna wan bêbersiv bimîne.

Yad û rêbaza wan di her gaveke ber bi azadiyê ve berdewam e, ew ne tenê bîranîn in, belkî hêz û îlhama me ya ji bo siberojeke azad in.



**Peyama sersaxiyê ya Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat bi boneya bûyera trafikê ya li Avdananê**

**Kak Mistefa Hicrî, Sikirtêrê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, bi belavkirina peyamekê, sersaxî li malbatên qurbaniyên bûyera wergeriyana otobûseke hilgirê karker û karmendên petropalavtinê li bajarê Avdananê kir.**

**Deqa peyamê bi vî rengî ye:**

Mixabin êvara roja şemiyê 23yê Xezelwera 1405an, wergeriyana otobûseke hilgirê karker û karmendên petropalayişê li bajarê Avdananê, bû sedema canjidestdana herî kêm 12 kesan û birîndarbûna zêdetirî 15 kesên din.Nûçeya canjidestdana van welatiyan ku li gorî zanyariyan xelkê Avdanan û Mûrmûrî yê li parêzgeha Îlamê ne, em ji kûrahiya dil ve dilgiran û xembar kirin.

Vê bûyera tehl pêlek ji xem û kovaniyê xiste nav dilê welatiyên me û bi vê boneya cihê xembariyê ve, ez sersaxiyê li malbatên qurbaniyên vê bûyerê û herwisa tevahiya xelkê Kurdistanê û bi taybetî hevniştimaniyên me yên li parêzgeha Îlamê dikim û hêviya min aramî û sebra wan e.

Herwisa hêviya tenduristiyê ji bo birîndarên bûyerê dixwazim.

**Mistefa Hicrî**

**Sikirtrê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê**

**24ê Xezelwera 1405an**

## Analîzek li ser şoreşa «Jin, Jiyan, Azadî» ji nêrîna teoriyên kiryarên giştî



Mijara vê rûpelê derbarê analîzkirina şoreşa «Jin, Jiyan, Azadî» li gorî teoriyên derûnî-civakî û sedemên ne-giştîbûna wê li seranserê Îranê de ye. Ji aliyê N. Kawe Ahengerî ve hatiye nivîsandin û ji aliyê Hesen Mukerem ve hatiye wergerandin.

**RUPELA 9**

## Sîbera tirsê , Qeyrana benzînê û egera dubarebûna xezelwera 98an




Mijara vê rûpelê derbarê Qeyrana benzînê û sînordarkirina destragihîştina pê, metirsiya dubarebûna nerazîbûnên wekî xezelwera 98an li Îranê zêde kiriye. Ji aliyê Xatûn Aso Minbarî ve hatiye nivîsandin.

**RUPELA 3**

## Çima em bi farsî dinivîsin?




Mijara vê rûpelê derbarê sedemên nivîsîna bi zimanê farsî li şûna kurdî û bandorên wê yên nerînî li ser lawazbûna hizir, wêje û pêşeroja zimanê dayikê de ye, tevî pêşniyarkirina rêbazên pratîkî ji bo parastin û vejandina kurdî. Ji aliyê N. Hemîd Çepatî ve hatiye nivîsandin.

**RUPELA 5**

# Daxuyaniya Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê, bo piştîvaniya li xwenîşandanên xelkê Awdananê




Roja sêşemê 26ê xezelwera 2726an (17ê nûvembera 2026an) xelkê têkoşer ê awdananê, li dijî sîstem û karbidestên gendel û bo redkirina komara îslamî ya îranê, hatin ser şeqaman û bi dirûşmên xwe careke din desthilat û rewatiya wî rêjîma dagirker red kirin.

Ev xwepêşandan û nerazîbûn piştî karesata wergeriya pasekê li awdananê serî hilda, ku ji ber xirabiya rêkên hatinûçonê û nebûna xizmetguzariya hawarhatinê ya hewce bû sedema canjidestdana 13 endazyar û karkerên pîşesaziya neftê û birîndarbûna 17 kesên din.

Ev bûyera karesatbar careke din nebûna hawarhatinê, nestandardbûna rêyên hatûçûnê û neberpirsyariya sazî û dezgehên peywendîdar kire pirseke cihê balkişandinê û pêleke hêrs û nerazîbûnê di nav xelkê awdananê de çêkir. Digel wê yekê jî, nerazîbûnên roja sêşemê 26ê xezelwerê yên awdananê tenê di daxwaza lêpirsînê li ser vê karesatê de asê neman û bi lez reng û rûyê siyasî û dijîhikûmetî bi xwe ve girtin.

Xelkê wêrek û netirs ê awdananê xwedîderketin li qurbaniyên wê karesatê kir û li dijî desthilata totalîter û dagirker a komara îslamî dengê xwe bilind kir. Digel wê yekê jî ev tenê bertek li hemberî wê bûyera karesatbar û nebûna xizmetguzariya rê û banan nebû, belkî xelekek e ji zincîreya xebat û rabûna neteweyî ya kurdistanê û rehên wê bo komek pirs û qeyranên keftî serhev yên siyasî, civakî, aborî û ewlehiyê vedigerin. Herwisa dîmeneke din ji pêşengiya kurdistanê di redkirin û xebata li dijî dîktatorî û serederiyê û nedadperweriyê nîşan dide.

Xwepêşandan û nerazîbûnên roja sêşemê 26ê xezelwerê xelkê nîştecihên awdananê, wek her tim ji aliyê hêzên ewlehiyê ve bi êrîş û girtin û lêdan û bikaranîna gaza rondikrêj û qutkirina hêlên înternetê, hewla tepeserkirin û vemirandina wan hat dayîn. Amrazên ku ne rêjîm ji qeyranan rizgar kiriye û ne xelkê kurdistanê xistine qedeman û bêdeng kirine.

Kurdistaniyan li seranserê welat ew rastî ezmûn kirine ku Tehran çavkaniya hemû qeyranan û tevahiya wan gefan e ku li ser jiyan û ewlehiya wan in. Di heman demê de di wê yekê jî têgihîştine ku di çarçoveya vê rêjîm û desthilatê de, ti aso û hiviyekî zelal bo çaksazî û bidawîhatina rojreşiyan nayê dîtin. Her ji ber vê yekê dengbilindkirina li dijî rêkên hatinûçonê yên seqet û li dijî rêveberên gendel, bi lez bo armancgirtina tevahiya rêjîmê bilind bû.

Hevpeymaniya hêzên siyasî yên kurdistana îranê, tevî sersaxiyê li kesûkarên qurbaniyên karesata awdananê, piştevaniya xwe ji hatina ser şeqaman û dengbilindkirina xelkê taziyebar û xembar ê awdananê nîşan dide.

Hevpeymaniya kurdistanê, daxwaz ji xelkê seranserê rojhilatê kurdistanê dike bi her awayekî ji bo wan çêbibe, piştgirî û hevgirtinê bo xelkê Awdananê nîşan bidin. Daxwaz ji rêxistinên sivîl û kom û komeleyên mafên mirovan û medyayê dike, di demekê de ku rêjîma Îranê bi ragirtina hêla înternetê, dixwaze û li cehda xendiqandina hawara xortên welatê me ye, çav û bala wan li ser Awdananê û bûyerên wê be.

**Hevpeymaniya hêzên siyasî yên kurdistana îranê**

**27ê xezelwera 2726**

# Desthilata înkarê û diyarîkirina pişka zikê gel



N. Serbest Urmiye

Nan di jiyanê de tenê hewcehiya xwarinê nine, nîşaneya ewlehî, rûmet û mafê mirovan e di asta herî kêm de ji bo dabînbûna mafê jiyanê. Dema ku civakek ji bo dabînkirina pêdiviyên xwe yên herî bingehîn bi metirsiya sînordarkirin û dabeşkirinê re rû bi rû dibe, êdî mijar ne tenê mijareke aborî û îdarî ye, belku divê li dor kêrhatîbûna desthilatê, berpirsiyariya siyasî û hewlên desthilatê bo dabînkirina jiyana gelê were gotin.

Siyaseta diyarîkirina pişka nan, heke bibe sedema sînorkirina gel ji bo dabînkirina hewcehiya here sereke ya jiynê,civakê ber bi rûyê vê pirsê dike ka gelo çawa dibe welateke xwediyê çavkaniyên xwezayî, kderfetên herî zêde yên çandiniyê û hêza mirovî ya berfireh, gihîştiye wê qonaxê ku dabînkirina nanê rojê bo welatiyên yê dibe pirsgirêkeke ewlehiyê?

Di rewşeke wiha de, valahiya di navbera rastiya jiyana mirovan û gotara fermî ya civak û desthilatê de zêdetir derdikeve. Mirovên ku dijwariya rewşa jiyanê ji bo dabînkirina xwarinê bibîne û pirsên weke zêdebûna bihayan, kêmbûna hêza kar û xebatê gefê li jiyana wan bike, li hember desthilatekê radibe ku krîza hindur înkar dike û dixe sitûyê hegerên bîhanî û derveyî berpirsiyariya pergala rêveberiya welat.

Eva rast ew pirse ye ku dibe semem ku mirov bikare ji têgeha desthilata înkarkirinê bêtir fêm bike, pirsek ku li şûna bersîvdayîn û eşkere bûna koka tevlîhevî û krîzan de, dibe pirsa ewlehî û parastina desthilatê.

**Desthilata înkarkirin, înkarkirina rastiyê li şûna berpirsiyariyê**

Yek ji taybetmendiyên nerênî yên rêveberiyê di heyamê qeyranê de, valahiya di navbera ezmûna welatiyan û gotar û ragihandina fermî ya desthilatê de ye. Dema ku nûçeyên derbarê parvekirin û sînordar kirînê de belav dibin, basa hişmeniyê di ware mifah wergirtinê de tê kirin û dema ku gel loma ji zêdebûna biha û xerca jiyanê dike, berpirsiyarên hikûmetê qala alîkariyên aborî û diyarikirina asta bihayên hewcehiyên jiyanê dikin. Dema ku metirsî li ser rewşa jiyanê û nîgeraniya giştî zêde dibe, bedel bersiveke zelal û hûr û gir kirina biryaran, li ser pilaneke hejî ji bo mifahwergitina bi wec tê israr kirin.

Wateya desthilta berpirsiyar ne ew e ku dewlet çi carî bi krîzê re rû bi rû nebe. Ev yek tê vê wateyê ku dema ku krîz derdikeve, agahiyên rast û zelal bide gel. xwedî biryarên xwe derkeve û li hember encamên wan de berpirsiyar be û bersivdê bide.

**Nan, pirsa girêdayî bi rûmeta mirov**

Nan tenê tiştekî aborî nîne: ew rasterast bi rûmeta mirovî ve girêdayî ye.

Civakek ku welatiyên wê ji bo kirîna xwarina rojê ber bi rûyê diyarikirina pişkê, kart, sînordarkirinê û hesabên tevlihev ên îdarî dibin, kêmasiyeke mezin di jiyan û jiyana civakî ya xwe de tecrûbe dikin. Mafê têrkirinê û xwarina hêjayî jiyana gel yek ji bingehên mafên aborî û civakî yên mirovan e û erkê dewletan e ku rewşeke wiha pêk bînin da ku çu kes ji ber xizanî û bêkariyê ji dabînkirina xwarina hewce



bêpar nemîne. Di vê alî de, pirsa sereke ne ew e ku her kes di rojê de çend nan dixwe, pirsa bingehîn ev e ka çima di welatekê de ku xwediyê wan hemû derfetan e di her aliekê de, dibe ku xwarina welatiyan bi pirsa ewlehiyê ve were girêdan. Çima dibe ku siyaseta aborî di cihê ku di xizmeta jiyaneke baştir bo gel de be, nanê ser sifrê û jiyana gel bike parsenga rêkxistina hevsengiya hesabên aborî yên hikûmetê?

Dema ku dewlet nikare nanê gel dabîn bike, lê hewl dide rastiya birçîbûna wî înkar bike, êdî pirsgirêk tenê kêmbûna nanê nîne: pirsgirêk kêrnehatîbûna desthilatê û qeyrana meşrûiyetê ye di navbera gel û desthilatê de.

# Sîbera tirsê , Qeyrana benzînê û egera dubarebûna xezelwera 98an



N. Aso Minberî




Heft sal bi ser xezelwera xwînawî ya 98an re derbas dibin, mehek ku giranbûna ji nişka ve ya nirxê benzînê, bû sedema serhildana nerazîbûneke berfireh li Îranê û di bersivê de, tepeseriyekî xwînawî ji aliyê hêzên ewlehî yên Komara Îslamî ve bi xwe re anî.

Niha û di sala 1405an de, careke din benzîn bûye yek ji xalên herî girîng ku nîşandera nakokiya navbera desthilat û xelkê ye. Bi wê cûdahiyê ku qeyrana vê carê tenê pêwendiya wê bi giranbûna nirxê benzînê re nîne, belkû mijar sînordarbûna destragihîştina xelkê bi benzînê û çawaniya dabeşkirina vê hewcehiya girîng e.

Xezelwera 98an û bûyerên wê, wek bîranîneke tal di serkuta xelkê nerazî û binpêkirina sîstematîk a mafên mirovan di dîroka Kurdistan û Îranê de tên hesibandin, lê ev ne hemû mijar e.

Nerazîbûnên xezelwerê dikarin wiha lê bêne nêrîn ku çawa biryareke aborî ya nebaş, bêyî helsengandina rewşa xelkê û jiyana wan, karî pêleke ji hêrs, nerazîbûn û ji hemûyan girîngtir bêbaweriyê li hember desthilatekê çê bike û çeqmaxê serhildaneke mezin a civakî lêbide.

Di 24ê xezelwera 1398an a rojî de, biryara ji nişka ve ya girankirina benzînê, xelkeke zêde li bajarên cûda yên Kurdistan û Îranê anîn ser şeqaman. Dirûşmên pêkhateşikên bi lez û bezeke pir zêde, ji daxwaziya aborî gihîştin asta nerazîbûneke rasterast a li dijî desthilatê û bi armancgirtina tevahiya desthilatê û ji hemûyan girîngtir Elî Xamineyî wek rêberê wê demî yê rêjîmê, rûpeleke din di dîroka xwe de li dijî wê desthilatê vekirin.

Ewa ku bûyerên wê demê kir bûyereke dîrokî û xezelwera xwînawî ya 98an bi xwe re anî, tenê giranbûna benzînê nebû, belkû şêweya bersivdana desthilatê bû!

Bikaranîna hêza çekdar, kuştina xwepêşanderan, desteserkirina xweseran û qutkirina hêlên înternetê, aliyekî din ê wê bûyerê bûn û tevî hemû wê serkutkariya eşkere û bêrehmane, xezelwer di bîra civakê de her maye.

Niha û heft sal piştî wê bûyerê, rewşa aborî ya Îranê careke din benzîn kiriye navenda gotûbêj û nerazîbûnan.
Ji 17ê xermanana îsal ve, nirxa benzîna derveyî pişkdariyê ji 5 hezarî bo 10 hezar tumen hate bilindkirin, di demekê de ku pişka 60 lîtran bi nirxa 1500 tumen û 50 lîtr bi nirxê 3000 tumen ji bo maşînan her wek xwe ma. Bi vî awayî sîstema sê-nirxî ya benzînê cîgir bû, lê ev dawiya guhertinan nebû.

Ji destpêka nûvembera îsal ve, karta şewatê ya hevpar a wêstgehan li 11 parêzgehan hatin komkirin, ev biryar destragihîştina şofêran bi benzîna li derveyî pişka wan a kesane sînordartir kir.

Digel vê yekê jî, nûçeya dirêjbûna rêza wergirtina benzînê li bajarên Îranê, di nav wan de Çabahar û Îranşehr, belav bû. Li gorî raporên belavbûyî li Çabaharê, hejmarek ji welatiyan piştî nêzîkî 90 deqeyan li bendêbûna di rêza wergirtina benzînê de, ji aliyê îstasyonsan ve hatine agahdarkirin ku pişka benzînê qediyaye.

Ji aliyekî din ve, destpêkirina dabeşkirina benzîna super bi nirxê nêzîkî 103 heta 110 hezar tumen ji bo her lîtreyekê, cûdahiya navbera nirxên benzînê û fişarên li ser bikarhêneran zêdetir kiriye.

Rast e ku ev nirx taybet bi benzîna super e û nabe bi benzîna ku bi pişk tê dayîn re bê berawirdkirin, lê ev yek eger di çarçoveya kirîza giştî ya enerjiyê de lê bê nêrîn, nîşana cûdahiya zêdetir di destragihîştina bi sotemeniyê de ye.

Ev giranbûn di demekê de ye ku aboriya Îranê bi sedemên wek bilindbûna nirxa hewcehiyên jiyanê û xizmetguzariyan, daketina hêza kirînê ya xelkê û daketina hêza darayî ya malbatan, di rewşeke dijwar de ye.

Digel van hemûyan jî, bilindbûna nirxa benzînê tenê bandorê li ser lêçûna xwediyên maşînan nake, belkû bi rêya bilindbûna krêya veguhastinê û lêçûna veguhastina hewcehiyan, dikare bandoreke rasterast li ser nirxa xwarinê û pêdiviyên sereke û girîng ên jiyanê bike ku ev jî fişareke zêdetir dixe ser qata navîn û hejar a civakê.

Di asta desthilatê de, helwestên fermî yên derbarê qeyrana benzînê cihê ramandinê ne. Di nîveka meha nûvemberê de, Îsmaîl Seqab Îsfehanî, berpirsê rêxistina çaksazî û rêveberiya bikaranîna enerjiyê, behsa hebûna pirsgirêkê di dabînkirina benzînê de kir û daxwaz ji xelkê kir ku ji bo karûbarên xwe yên pêwîst, beşek ji pişka benzîna xwe paşekeft bikin.

Di heman demê de, biryara komkirina karta wêstgehan û sînordarkirina destragihîştina bi benzîna derveyî pişkê hat dayîn ku ev nîşana qeyrana kûr di dabînkirina sotemeniyê de li Îranê wek pirseke aborî nîne, belkû divê wek pirsgirêka rêveberî û civakî lê bê nêrîn.

Li vir e ku ev pirs tê pêş: gelo ev hewildanên rêjîmê ji bo sînordarkirina destragihîştina bi benzînê encama tirsê ji dubarebûna xezelwera 98an û nerazîbûneke nû ye?
Di encama vê yekê de gelo berdewambûna vê fişara aborî dikare bibe sedema destpêkirina kombûnên nerazîbûnê û serhildana cureyeke din ji nerazîbûnan?
Di rastiyê de nayê pêşbînîkirin ku bi piştrastbûna bi guhertina nirxê benzînê û dirêjbûna rêzên wergirtina benzînê, sedji-sed xwepêşandaneke din bi şêweya xezelwera 98an rû bide, lê eşkere ye ku benzîn li Îranê tenê hewcehiyekî di çarçoveya enerjiyê de nîne, belkû pirseke hestiyar û girîng a siyasî jî ye ku derbasbûyeke xwînawî heye.

Di civakekê de ku xelk li hember desthilatê bêbawer in û fişar berdewam di zêdebûnê de ne, pêşeroj ji ber şer û aloziyan tûşî nezelaliyê bûye û hêviya xelkê ya bi jiyanê di lawaziyeke pir berçav de ye, her biryareke nû li ser nirxê benzînê dikare bibe hevîna serhildana nerazîbûneke siyasî ku bi berçavgirtina bûyerên salên borî yên piştî xezelwera 98an, dikare zêdetir gur bibe.

Xezelwera 98an hîn di bîra xelkê de maye û pirsa sereke ew e ku vê carê divê çiqas bar giraniyê bixe ser milê xelkê û bê çavnihêrîkirin ku bi bêdengî rûnin û çi nekin?

# Li vî welatî de, heta şoreşê jî tam û xweşiyekî din heye!



N. Hesen Mukerem



Rojhilatê Kurdistanê, welatê şoreş, berxwedan û xewna azadiyê, ji Pêşewa Qazî Mihemed heta nifşa hişyar a îroyîn, li vî welatî de her tişt xwedî tam û wateyekî din e, heta şoreş û rabûna gel jî.

Ev gotin tenê hevokeke bedew û helbestî nîne, ew rastiyeke kûr a dîrokî û neteweyî ye ku di hiş û bîra gelê Kurd de cih girtiye. Li Rojhilatê Kurdistanê, şoreş tenê têkoşîna ji bo guhertina desthilatdariyê nine, ew dengê dîrokê ye, bangewaziya azadiyê ye û daxwaza jiyaneke bi rûmet û serbest e.

Rojhilatê Kurdistanê ji bo gelê Kurd tenê parçeyek ji erdnîgariya Kurdistanê nîne. Ew warê bîra hevpare ziman, çand, nasnameya neteweyî û berxwedana nifşên li pey hev e. Li vê axê, her kevir çîrokeke xwe heye, her çiya şahidiya berxwedanekê dike û her nifş bi xwe re hêvî û xewnên nifşa berê hildigire.

Ji vê dîtingehê ve, şoreş li Rojhilatê Kurdistanê wateyeke taybet heye. Ew tenê li dijî zilm û zordariyê rabûn nîn, ew daxwaza mafên neteweyî, azadiya siyasî, parastina nasnameyê û mafê gelê Kurd e ku paşeroja xwe bi destê xwe diyar bike. Ev têkoşîn ji bo mafê jiyaneke bi rûmet, wekhevî û azadiyê ye.

Dîroka têkoşîna neteweyî ya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bi nav û bîranînên gelek kesayetiyên siyasî û dîrokî hatiye nivîsandin. Ji berhemên berê yên têkoşîna neteweyî û kesayetiyên wekî Simkoyê Şikakî bigire heta damezrandina Komara Kurdistanê, ev rêbaz bi fîdakariyên gelek nifşan hatiye domandin.

Her çend nirxandina rola kesayetiyên dîrokî pêdivî bi lêkolîn û nêrînên cuda heye, lê nikare rastiya têkoşîna gelê Kurd ji bo maf û hebûna xwe tune bike.

Di vê dîrokê de, Pêşewa Qazî Mihemed cih û girîngiyeke taybet digire. Wî di 22ê Çileya 1946an de li Mehabadê damezrandina Komara Kurdistanê ragihand û bû yekemîn serkomarê wê komarê. Komara Kurdistanê, tevî ku temenek kurt hebû, bû sembola hêvî, yekîtiya neteweyî û xwesteka gelê Kurd ji bo rêvebirina xwe bi destê xwe.

Di 31ê Adara 1947an de, Pêşewa Qazî Mihemed li Mehabadê hate darvekiri, lê îdeala ku wî temsîl dikir bi darvekirinê re nemir. Ew îdeal di bîra neteweyî ya gelê Kurd de maye û ji nifşekê derbasî nifşekî din bûye.

Piştî wî, Dr. Ebdulrehman Qasimlo jî wekî yek ji kesayetiyên girîng ên siyasî û rewşenbîrî yên Kurdistanê derket pêş. Ew bi nêrîna xwe ya li ser demokrasiyê, diyalogê, azadiyê û mafên neteweyî, nûnerê têkoşîneke siyasî ya modern bû.

**Dr.Qasimlo li ser vê baweriyê bû ku çareseriya pirsgirêka Kurdistanê divê li ser bingeha demokrasiyê, hevpeymanî û nasîna mafên gelê Kurd were avakirin. Ew di 13ê Tîrmeha 1989an de li Viyanayê hate terorkirin, lê hizir û rêbaza wî ya siyasî hîn jî di nîqaşên li ser paşeroja Kurdistanê de xwedî girîngiyê ne.**

Îro nifşa nû ya Rojhilatê Kurdistanê mîrateya vê dîrokê hilgirtiye. Ev nifş tenê mîrata êş, girtîgeh û qurbaniyan nagire, ew mîrat hêvî, xwesteka azadî û daxwaza jiyaneke cuda jî digire. Ciwanên Kurd mafê wan heye ku bijîn, bixwînin, bi zimanê xwe biaxivin, nasnameya xwe biparêzin û paşeroja xwe bê tirs û zextê ava bikin.

Lê mixabin, li Rojhilatê Kurdistanê zextên siyasî, binpêkirina mafên microvan, girtinên bêdadwerî û cezayên giran hîn jî jiyana gelek kesan dixe bin metirsiyê.

Gava ciwanekî Kurd bi tohmetên siyasî yên wekî sîxurî an hevkariya bi dijmin re tê darizandin, pêdivî ye ku hemû tohmet bi delîlên yasayî, dadgeheke serbixwe û pêvajoyeke dadmend were nirxandin.

Îtîrafên di bin zext û îşkenceyê de hatine wergirtin nikarin bibin bingeha dadweriyê. Mafê parastinê, dadgeha dadmend û mafê jiyanê mafên bingehîn ên her mirovekî ne.

Mafê gelê Kurd ji bo nasnameya xwe, zimanê xwe, çanda xwe û biryara li ser paşeroja xwe ne mijareke ku bi zext û cezayên giran were înkarkirin. Pirsgirêka Kurdistanê pirsgirêkeke dîrokî, neteweyî û siyasî ye, pirsgirêkeke ku bi dabeşkirina Kurdistanê, înkarkirina nasnameya Kurd û binpêkirina mafên gelê Kurd ve girêdayî ye.

Ji ber vê yekê, çareseriya wê jî divê li ser bingeha nasîna mafên neteweyî, azadî, demokrasî û mafê gelê Kurd ji bo diyarkirina çarenûsa xwe were avakirin.

Şoreş, di wateya xwe ya kûr de, tenê hilweşandina desthilatdariyekê nine, şoreşa rastîn ew e ku civakeke azad, dadmend û demokratîk ava bike. Şoreş divê rê li ber jiyaneke bi rûmet veke, mafên mirovan biparêze û azadiya hemû gel û pêkhateyan misoger bike.

Têkoşîna ji bo azadiyê divê ji zilmê dûr be û li ser bingehê hişmendî, yekîtiyê, dadmendiyê û rûmeta mirovî were domandin.

Rojhilatê Kurdistanê dîrokeke dirêj a berxwedanê heye, lê paşeroja wê divê tenê bi êş û qurbaniyan neyê pîvan. Paşeroja wê divê bi hêvî, zanîn, azadî û îradeya gel were avakirin. Nifşa îroyîn ne tenê xwediyê bîranînên dîrokê ye, ew xwediyê mafê avakirina siberoja xwe jî ye.

Ji ber vê yekê, gotina «Li vê welatê her tişt xwedî tam û çêjeke din e, heta şoreş û rabûna gel jî» ji bo me tenê gotineke bedew nine, ew nîşana nasnameyekê, bîranîneke hevpar û îradeya gelê Kurd e ku dixwaze bi azadî û rûmet bijî.

# Çima em bi farsî dinivîsin?



N. Hemîd Çepatî




Dema kesek twîtekê dinivîse, storiyekê parve dike yan jî postekê datîne, beriya her tiştî hizir li wê yekê dike ku bê dîtin. Dîtin di vê çarçoveyê de tê wateya ku xelk naverokê bixwînin, jê têbigehin, li ser biaxivin û nivîser bi xwe jî hest bike ku gotara wî cihê xwe girtiye û hatiye bihîstin. Ev daxwazeke mirovî û civakî ye û ti kêmasî an şermek tê de nîne.

Pirsgirêka sereke ji wê derê dest pê dike ku ev heza dîtinê, me ber bi zimanekî ve dibe ku ji bo me bûye zimanê perwerde û saziyên fermî, ne ew zimanê dayikê ku li mal û kolanan em pê diaxivin û em pê mezin bûn. Gelek ji me, li şûna ku bi kurdî binivîsin, bi farsî dinivîsin. Ev hilbijartin carinan ji ber adetê ye, carinan ji ber hestkirina bi kêmasî û neşarezatiya di nivîsîna kurdî de ye, û di piraniya rewşan de jî li ser bingeha hesabekî pratîkî û hejmarî ye: hejmara xwendevan û temaşevanên farsî pir zêdetir e.

Ev hesabê hejmarî ji aliyê rastiyên civakî ve bêbingeh nîne. Sîstema perwerdeyê, medyaya giştî û înternet, farsî wekî zimaneke berbelav û li ber dest pêş xistiye ku beşeke mezin a civakê dikare pê bixwîne. Kesê ku bi kurdî dinivîse, baş dizane ku qada xwendevanên wî sînordartir e, dibe ku hinek alfabeyê nizanibin, hinek di xwendina kurdî de ne şareza bin, û hinek jî li naverokekê bigerin ku bêyî astengiya zimanî bilez jê têbigehin. Di vê rewşê de, nivîsîna bi farsî weke rêyek xuya dike ku kêmtir berxwedan û astengî li pêşiya wê hene, û nivîser bawer dike ku bi rêya zimanê serdest peyama wî zûtir û bi bandortir digihêje.

Lê belê, ev pratîk encameke bêdeng, kûr û zirardar li pey xwe dihêle. Ziman ne tenê amrazeke veguhestina peyamê ye, di zanîn û felsefeya ziman de, ziman çarçoveya têgihiştin, kategorîzekirin û hizirkirina me ye. Dema ku em bi salan bi zimanek ji bilî zimanê dayikê bifikirin, binivîsin û gengeşeyan bikin, hêdî hêdî têkiliya me ya kûr bi zimanê dayikê re lawaz dibe. Kurdî ji bo gelek kesan vediguhere zimanê axaftinên rojane yên malê, henekan û merasîmên civakî, lê nîqaşên giran, lêkolînên zanistî, fikrî û siyasî ber bi farsî ve tên veguhastin. Ev dabeşkirina kar a zimanî di destpêkê de bêziyan xuya dike, lê di dirêjahiya demê de ziman ji qadên bilind ên hizirê dûr dixe. Zimanek ku kêmtir ji bo analîz û fikra kûr bê bikaranîn, di afirandina têgeh û termînolojiya nû de sist dibe û nifşê nû, heta di derbirîna hest û êşên xwe yên kûr de jî, rastî valahî û kêmasiyan dibin.

Ev diyardeya ne tenê pirsgirêkeke takekesî ye, belkî xwedî rehendeke kûr a civakî û çandî ye.

**Dema ku beşeke berçav a rewşenbîr û nivîskarên civakekê berhemên xwe bi zimaneke din binivîsin, qada giştî û nîqaşên stratejîk dikevin bin bandora wî zimanî. Heta şêwaza dîtin û şîrovekirina bûyeran jî ji nêrîna wî zimanê serdest bandor dibe.**

Di wêje û rexneya çandî de, ev rewş weke dagîrkirina hizir (hegemoniya zimanî-fikrî) tê pênasekirin, ku mirov heta dema behsa êş û pirsgirêkên xwe yên xwemalî jî dike, bi berçavk û pîvanên derve li wan dinêre.

Bêguman, nayê gotin ku berpirsiyariya vê rewşê bi tevahî li ser milê nivîseran e an jî tenê ji ber xemsariyê ye. Di zanista ziman de, şiyanên zimanî bi awayeke cuda tên bidestxistin: mirov guhdarîkirin û axaftinê bi awayeke xwezayî di nava malbatê de fêr dibe, lê xwendin û nivîsîn, bi taybetî nivîsîna zanistî û rêkûpêk, pêdivî bi perwerdeya fermî, dibistan û zanîngehê hene. Sîstema perwerdeyê û siyasetên zimanî li vir roleke yekalîker dilîzin. Zarokek ku ji destpêka temenê xwe ve tenê bi zimanê farsî xwendiye, xwezayî ye ku di nivîsîna kurdî de zehmetiyê bibîne.
Kêmbûna çavkanî û pirtûkên standard, nebûna derfetên pratîka nivîskî û kêm nirxandina fermî ya ziman, hemû bi hev re vê rewşê ava dikin. Ji ber vê yekê, ev kêşe berhemê têkiliyeke hevbandor a di navbera takekes û pêkhateya civakî-perwerdehiyê de ye.
Lê dîsa jî, pêkhate û sîstem ji kiryar û hilbijartinên rojane yên mirovan pêk tên.

Her car ku nivîskarek dibêje «ez bi farsî dinivîsim ji ber ku xwendevanên wê zêdetir in», bi zanîn be an nezanîn, beşdarî wê yekê dibe ku qada xwendevanên kurdî sînordar bimîne. Ev rewş bûye çerxeke bêdawî: ji ber ku kêmtir bi kurdî tê nivîsîn, xelk kêmtir fêrî xwendina wê dibin, û ji ber ku kêmtir tê xwendin, kêmtir kes bi kurdî dinivîsin. Şikandina vê çerxê pêdivî bi hewldaneke hişmendane, sebir û qurbanîdana demê heye. Di qonaxa destpêkê de dibe ku xwendin û dîtina nivîser kêmtir bibe û pêvajo dijwartir be, lê ev gav ji bo vejandina ziman pêwîst e.

Ti rêbazeke efsûnî û bilez tune ku vê rewşê di şevekê de biguherîne, lê dikarin model û rêbazên afirîner û pratîkî bên bikaranîn. Bo mînak, nivîsîna duzimanî ya stratejîk: nivîsandina teksta bingehîn bi kurdî û danîna kurteyek an wergerandineke wê bi farsî li kêleka wê. Herwisa, çêkirina naverokên resen, kûr û balkêş bi kurdî ku bixwe xwendevan bikişîne. Pêşketinên teknolojîk, texteklîlên kurdî yên standard û ferhengên dîjîtal îro nivîsîna kurdî li gorî berê pir hêsantir û berdesttir kirine.

Ji her tiştî girîngtir, guhertina nêrîna me ye. Nivîsîna bi kurdî ne tenê erika neteweyî ya giran an erkekî neçarî ye, di heman demê de hesta xweş a wê yekê ye ku mirov bi zimanê xwe bifikire û biafirîne. Ger kurdî tenê ji bo gazinde û gilîkirinê bê bikaranîn, zû yan dereng xwendevan jê dûr dikevin. Lê dema ku wêje, çîrok, gotarên rexneyî, henekên zindî û nîqaşên zanistî û civakî pê bên nivîsandin, ziman dînamîzma xwe ya xwezayî bi dest dixe.

Di encamê de, hilbijartina zimanê nivîsînê biryareke bêbandor û bêalî nîne. Her car ku em pênûs digirin destê xwe yan li ser bişkokên texteklîlê dinivîsin, em ber bi yek ji du arasteyan ve diçin: yan em alîkariya paşguhxistin û lawazbûna zimanê dayikê dikin, yan jî em qadê ji bo man, pêşketin û berdewamiya wî ava dikin. Kes îddia nake ku ev rê hêsan e, lê zimanek ku gelek nifşan ji bo parastina wê ked û bedel dane, bi temamî hêjayî wê yekê ye ku em bi sebir, zanîn û berpirsiyarî ji bo pêşeroja wê bixebitin.

# Nûnasandina Têkoşîna Kurdî di Serdema Veguherînên Mezin de



N. Dr. Mehmûd Ebas



**Beşa Yazdehem**
**Em Çawa Gotareke Kurdî ya Cîhanî Ava Bikin?**

Tenê dadmendiya dozê têrê nake ku ew li cîhanê cihê xwe bibîne, divê xwediyê wî zimanî jî be ku cîhan bi rêya wî wê bibîne, têbigihîje û pê re bikeve têkiliyê. Ev yek ji girêkên herî hestyar ên rêça nûjen a Kurdî ye. Doza Kurdî, tevî kûrahiya xwe ya dîrokî, firehiya neheqiyên ku li ser gelê Kurd hatine kirin û zelalbûna mafên wî, hîn nekarî bi temamî bibe dozeke cîhanî ku di hişmendiya ramyarî û ramanî ya navneteweyî de cihê xwe yê pêwîst bigire.

Sedema vê yekê ne lawaziya dozê bi xwe ye, belku ew e ku gotara Kurdî di gelek qonaxên xwe de di nav hawirdora herêmî û pevçûnên rasterast de girtî ma. Ew di bingehê xwe de li hember desthilatên ku hebûna gelê Kurd nas nedikirin an mafên wî teng dikirin, ava bû. Ji ber vê yekê bi xwezayî bû ku berê xwe bide hundirê civaka Kurdî an derdora herêmî. Lê cîhana îro, her çiqas neheqî kûr be jî, tenê bi nalîn û vegotina êşê re nakeve têkiliyê, heger ew bi zimanekî ku bi têgehên serdemê re were têgihiştin neyê pêşkêşkirin.

Di pergala navneteweyî ya îro de, hêza gotarê tenê bi germiya wê an rastiya hestên wê nayê pîvan. Ew bi şiyana wê ya danîna dozê di nav têgehên mafên mirovan, dadmendî, demokratî, pirrengî, mafê gelan di diyarkirina çarenûsa xwe de û naskirina nasnameyên dîrokî tê pîvan. Yê ku ji vê dergehê nekeve cîhanê, gelek caran di nav dengê xwe yê herêmî de dimîne, her çiqas doza wî dadmend be jî.

Ji ber vê yekê, avakirina gotareke Kurdî ya cîhanî ne tenê wergerandina daxuyaniyan bo Îngilîzî an Fransî ye. Ew avakirina zimanekî ramyarî û ramanî ye ku doza Kurdî ji pelgeyek herêmî veguhezîne dozeke ku xwediyê wateyeke mirovî û ramyarî ya cîhanî be; ji gotareke nerazîbûnê ya ku tenê dijberên herêmî armanc dike, ber bi gotareke dûrnihêr ve ku bi cîhanê re wek aliyekî ku di avakirina têgihiştin, naskirin û bandorê de rol dileyize, biaxive.

Doza Kurdî ne mijareke neteweyî ya girtî ye, ne jî tenê pelgeyek sînoran e ku bi dewletên herêmê re girêdayî be. Ew doza gelekî dîrokî ye ku ji naskirinê hatiye bêpar kirin, erdnîgariya wî hatiye dabeşkirin, nasnameya wî hatiye şêwandin, û ziman, çand û bîranîna wî li ber tunekirinê hatine hiştin. Heger ev rastî di çarçoveyeke cîhanî de, bi zimanê maf, dadmendî, pirrengî û redkirina dûrxistinê bê pêşkêşkirin, doza Kurdî dikare di nav nîqaşên navneteweyî yên girîng de cihê xwe bi hêztir bigire.

Lê ev veguherîn pêdivî bi amûr û damezrandinan heye. Tevgerên ku karîne dozên xwe bikin beşek ji hişmendiya cîhanî, tenê xwe bi dirûşman ne girêdane. Wan torên têkiliyê bi zanîngeh, navendên lêkolînê, ragihandin, rêxistinên civakî, damezrandinên parastina mafan, civakên li derveyî welat û kesên çandî ava kirine. Bi gotineke din, wan tenê hebûna xwe ragihand nekiriye, wan ew rê û navend ava kirine ku vê hebûnê bikin berdewam, bawerpêkirî û xwedî bandor.

Li vir civakên Kurdî yên li Ewropa û Amerîkayê dikarin roleke pir girîng bilîzin, rolek ku hîn bi qasî pêdivî nehatiye bikaranîn. Ew ne tenê dirêjahiya civakî an hestyarî ya doza Kurdî ne. Heger rola wan ji xweberî û hewldanên kesane derbasî karê damezrandî û rêkxistî bibe, dikarin bibin pireke rastîn di navbera doza Kurdî û cîhanê de. Di nav van civakan de hêzên zanistî, pîşeyî, çandî, ragihandinî û yasayî hene ku dikarin doza Kurdî ji kêlekê bînin navendên bandorkirinê.

Lê çalakiya Kurdî li derveyî welat hîn jî gelek caran di bin bandora karê teng ê partiyan de ye, ku cudahî û lawaziya hundirîn kûrtir dike, an jî bi hewldanên kesane yên ji hev qut, an bersivên demkî yên li gorî bûyeran re tê rêvebirin. Ya ku îro pêwîst e gotareke dirêjdem e ku ji qonaxa bûyerê derbas bibe û neheqiya dîrokî bi dîtina pêşerojê ve girêde. Cîhan her tim bi doza ku tenê bang dike re nayêk, zêdetir bi doza ku dizane xwe wek beşek ji pirseke mezintir a cîhanî pêşkêş bike re têkiliyê datîne.

Li Rojavayê Kurdistanê, ev pêdivî hêj zêdetir xwe dide der. Ezmûna ku li wir çêbû êdî ne tenê mijareke navxweyî ya Sûriyê ye, ew bûye beşek ji lêpirsîneke firehtir li ser rêveberiya herêmî, rêveberiya xweser, pirrengiya ramyarî, berxwedana li hember tûndrewiyê û sînorên dewleta navendperest li Rojhilata Navîn. Ev yek derfetê dide gotara Kurdî ku ezmûnê ne tenê wek dozeke daxwazê, lê wek ezmûneke ramyarî û civakî pêşkêş bike ku dikare bibe beşek ji nîqaşa cîhanî li ser pêşeroja herêmê.

Lê ev yek pêdivî bi venêrîna nû di ziman û şêwazê de heye. Ne her tiştê ku li hundir tê gotin, ji bo cîhanê jî guncaw e, û ne her gotareke hestyarî û mobilîzekar dikare li derve bê têgihiştin. Cîhan pêdivî bi zimanekî firehtir heye, zimanekî ku hestê kêm bike û hêza girêdana taybetmendiya dozê bi nirxên hevpar zêde bike. Zimanek ku ezmûna Kurdî wek beşek ji lêgerîna firehtir li pey dadmendî, aramî û pirrengiyê pêşkêş bike, ne tenê wek pevçûneke herêmî li ser desthilat an erdnîgariyê.

Gotara ku digihîje cîhanê ew gotar e ku ya herêmî bi ya mirovî û giştî ve girêdide, êşa gelekî taybet bi wan bingehên ku mirovên din jî dikarin xwe tê de bibînin. Gava doza Kurdî wek doza gelekî bê pêşkêşkirin ku dixwaze nasnameya wî bê naskirin, mafê rêvebirina karên xwe hebe, ziman û çanda xwe biparêze û di avakirina nimûneyeke dadmendtir li herêmeke aloz de beşdar bibe, ew ji bo têgihiştin û piştgiriyê hêsantir dibe.

Ev jî tenê bi daxuyaniyên ramyarî nayê bidestxistin. Pêdivî bi karekî berdewam heye: ragihandineke Kurdî ya pîşeyîtir ji bo derve, lêkolînên zanistî li ser doza Kurdî, navendên raman û lêkolînê, axêverên ku dikarin bi cîhanê re biaxivin, û têkiliyên firehtir bi zanîngeh, damezrandinên parastina mafan û navendên bandora ramyarî û çandî re.

Cîhana nûjen tenê bi bûyeran re têkiliyê nade, ew bi wê wêneyê re jî têkiliyê dide ku li dora wan tê avakirin, bi wan çîrokan re ku wan rave dikin û bi wî zimanî re ku wan pêşkêş dike. Ji ber vê yekê, avakirina gotareke Kurdî ya cîhanî ne karekî ragihandinî yê li kêlekê ye; ew beşeke bingehîn ji nûnasandina tekoşîna Kurdî bi xwe ye.

Ji ber vê yekê, pirsa ku divê tevgera Kurdistanî îro li hember wê bisekine êdî tenê ev nîne: Em çawa doza xwe li hundirê sînorên xwe biparêzin? Lê divê ev jî be: Em çawa vê dozê bikin dozeke ku li hemû cîhanê bê têgihiştin, bê rêzgirtin û parastina wê pêkan be? Û em çawa gotara Kurdî ji gotareke ku tenê li ser xwe diaxive, veguhezînin gotareke ku cîhan di doza Kurdî de beşek ji lêpirsîna xwe li ser azadî, dadmendî û mafên gelan bibîne?

Di serdemeke ku naskirin û mafdarî bi ziman, wêne û wateyê tên avakirin de, gotar bi xwe dibe yek ji meydanên herî girîng ên tekoşînê. Yê ku nikare xwe bi başî bide naskirin cîhanê, her tim li ber wê metirsiyê ye ku yên din wî bi ziman û berjewendiyên xwe bidin naskirin, ne bi dengê wî bi xwe.

**Berdewam dike...**

## Nerîna Lîderan



**“Xalid Ezîzî”:**

**“Ji bo rûxandina Komara Îslamî, avakirina alternatîvê erkê pêşîn ê opozîsyonê ye.”**



**“Teymûr Mustefayî”:**

**“Bi piştrastbûna bi hêza gel, mirov dikare li hemberî hêzeke pirçek berxwedanê bike.”**



**“Donald Trump”:**

**“Wî peymana bi Komara Îslamî re wekî “winda kirina demê” bi nav kir û ragihand ku Washington dê di demek nêzîk de, bi her awayekî ku pêwîst be, mijara rûbirûbûna bi Tehranê re bi dawî bîne..”**



**“Romen Gofmen”:**

**“Mûsad piştevanî li encamdana êrîşa hevbeş ligel Amerîka dijî rêjîma Îslamî dike”**

# Navçe di siya şaştiyên siyasî yên rêjîma Îranê de kawil dibe!



N. Eskender Ceiferî




Di rewşekê de ku guhertinên herêmî û navnetewî bi lezeke bêhempa diherikin, siyasetên derve û hundir ên rêjîma Îranê, ev herêm xistiye ser lêva kendala krîzên kûr ên aborî, ewlehî û siyasî. Nêrînek li ser raportên herî dawî û pêşhatên deverê, di nav de têkiliyên navnetewî, zextên zêde yên dorpêçan û rûbirûbûnên leşkerî û saybêrî, xitimandinekê nîşan dide ku berhema bi dehan salan desthilatdariya îdêolojîk a rêjîma Îranê, rijdbûna wê li ser destêwerdanên herêmî û guhnedana sîstmatîk a ji bo berjewendiyên cîhanê û bi taybetî herêma Rojhilata Navîn e.

Karbidestên payebilind ên leşkerî û siyasî yên rêjîma Îranê di mehên dawî de gelek caran bi girtina helwêstên tund û êrîşkar hewl dane ku bêjin ev rêjîm bi hêz e. Ji axaftinên bi hêrs ên fermandarên Spaha têrorîstî ya Pasdarên Îranê bigire heya daxuyaniyên gengeşebar ên kesatiyên olî yên rêjîmê li ser «tevgera bêsînor û bêdawî», hemû basa nêzîkatiyekê dikin ku li ser înkarkirina rastiyan hatiye avakirin. Digel vê yekê, nirxandinên hûr ên pisporan û raportên saziyên ewlehiyê yên navnetewî piştrast dikin ku ev gotin, perdeyê li ser lawaziyeke mezin hil dide.

Di demekê de ku berpirsên hikûmî û leşkerî yên rêjîma Îranê basa «şikandina dorpêça neftê» û rûbirûbûna zextên derve dikin, aborî û jiyana rojane ya welatiyan di bin givaşên daketinê, kêmbûna çavkaniyan û goşegirbûna navnetewî de hatine pelçiqandin.

Rijdbûna rêjîma Îranê li ser parastina komên têrorîstî wek Hemas, Hizbulla, Hosî, Heşda Şeibî û projeyên leşkerî yên pir biha li herêmê, ne tenê ewlehî têk dane, belkî herêm kiriye navenda aloziyên wêranker. Li gorî raportên Pêntagonê û çavdêrên rojavayî, lêçûnên leşkerî yên pir giran û şerxwaziyên herêmî bi milyaran dolar ji sermayeyên neteweyên Îranê xisar kirine, di demekê de ku rewşa jiyanê li Îranê gelek xirab e.

Krîza rewatiyê ya rêjîma Îranê bi siyaseta derve ve sînordar nîn in, di qada navxwe de, makîneya tepeserkirinê bi hemû hêza xwe karê xwe didomîne da ku dengê her cure nerazîbûneke sivîl bibire. Derxistina cezayên giran, di nav de darvekirin û girtîgeha demdirêj ji bo xwepêşander û çalakvanên sivîl li Kurdistan, Belûçistan û Ehwazê, tirsa kûr a desthilatdariyê ya ji îradeya van neteweyan a ji bo guhertinê nîşan dide.

**Rijdbûna rêjîma Îranê li ser cîbicîkirina cezayên darvekirinê ji bo ciwanan û binpêkirina mafên mirovan, belgeyek e li ser vê rastiya tal ku rêjîma Îranê tenê li ser bingeha tirsandin, êşkence û tepeserkirinê hatiye avakirin.**

Di asta navnetewî de jî hevpeymaniyên herêmî û cîhanî yên li dijî siyasetên wêranker ên rêjîma Îranê roj bi roj tengtir dibin. Ji opêrasyonên saybêrî yên êrîşkar ên artêşên mezin ên cîhanê li dijî pêşesaziya saybêrî yên girêdayî desthilatdariya rêjîma Îranê bigire heya guhertina hevsengiya hêzê li Iraqê û vekişîna gav bi gav a komên têrorîstî yên ser bi rêjîma Îranê ji deverên cuda, hemû goşegirkirina stratêjîk a têoriya «bereya berxwedanê» nîşan didin.

Di rewşekê de ku berpirsên payebilind ên rêjîma Îranê îdiayê dikin ku hevpeymaniyên cîhanî yên li dijî Tehranê hatine şikandin, rastiyên berbiçav ên dîplomatîk basa girtina rêyên aborî yên rêjîma Îranê û tengtirbûna xeleka dorpêçan dikin. Ev jî nîşan dide ku pêkhateya siyasî ya desthilatdariya rêjîma Tehranê, xwedî wê nermbûna pêwîst nîn e ku xwe li gel rastiyên cîhanî biguncîne.

Rijdbûna dezgeha dîplomasiyê ya rêjîma Îranê li ser girtina helwêstên êrîşkar û gefxwarin li welatên cîran û hêzên cîhanî, ev rêjîm xistiye nav rewşa goşegirkirinê. Wezîrê Derve û berpirsên din ên desthilatdariya rêjîma Îranê di demekê de basa hewldanên ji bo firotina neftê û pûçkirina dorpêçan dikin ku binesaziyên ênêrjiyê yên rêjîma Îranê ji ber nebûna veberhênanê û kevinbûna amûran, şiyana bersivdayîna pêdiviyên bingehîn jî nîn in.

Siyasetên ku jê re dibêjin «aboriya berxwedanê» di pratîkê de tê wateya sepandina zexteke zêdetir li ser debara jiyana pêkhateyên jêrîn û navîn ên civakê, di demekê de ku desthilatdar û saziyên leşkerî mifahê ji rantên mezin ên vê aboriya girtî werdigirin.

Neteweyên erdnîgariya derewîn a Îranê, berdêla giran a rêveberiyeke neaqilane, bêkêr û şerxwaz didin. Rijdbûna rêjîma Îranê li ser berdewamiya doktrîna krîzçêkirinê, herêm ber bi şerekî giştî ve biriye. Derketina ji vê rewşa karesatbar, pêdivî bi guhertineke bingehîn di pêkhateya siyasî de û bidawîanîna siyasetên îdêolojîk heye ku berjewendiyên neteweyên herêmê kirine qurbaniyên armancên xeyalî yên rêjîma Îranê.

Tenê bi rêzgirtina li mafên bingehîn ên neteweyên herêmê û têkiliya avaker a bi cîhanê re mirov dikare hêvî bike ku herêm ji vê tundûtûjî, goşegirbûn û hejariyê rizgar bibe; armancek ku pêkhatina wê pêdivî bi hevgirtina li dijî rêjîma Îranê, hişyariya giştî û vîna hevbeş a welatên herêmê ji bo avakirina pêşerojeke azad, geş û dêmokratîk heye.

# Bêhroz Çemenara: «Kurdistan navendeke bihêz a siyasî û civakî ye»



Hevpevîn.Bêhroz Çemenara

Hevpeyvînkar. Sîmîn Rûhanîzade

**Bêhroz Çemenara, serokê Enstîtoya Navneteweyî ya Lêkolîna Civaka Kurdî-Alman, di vê hevpeyvînê de balê dikişîne ser krîza aborî, nerazîbûna civakî û astengên rêxistinbûna xelkê li Îran û Kurdistanê. Li gorî wî, zextên aborî nerazîbûnê zêde dikin, lê di heman demê de hêza beşdarbûna civakî jî kêm dikin.**

**Nerazîbûna civakî û krîza baweriyê**

**Bi berçavgirtina kombûnên vê dawiyê yên komên cuda yên civakê li çend bajarên Îran û Kurdistanê, wekî greva şofêran û nerazîbûna kedkar, pizîşk û kadrên dermanî, berdewamiya van tevgirên civakî di rewşa niha de çi wêneyekê ji rewşa civakê û asta nerazîbûna gişti nîşan dide?**

Bêhroz Çemenara: Li gorî min, girîngiya van nerazîbûn û xwepêşandanan di vê yekê de ye ku komên di rewşên pir cuda de, ji ajovan û karkeran bigire heta pizîşk û welatiyan, gihîştine vê encamê ku bi rê û rêbazên asayî nikarin mafên xwe bişopînin û daxwazên xwe pêş bixin.

**Ji bo gelek kesan, enflasyon wateya windakirina encama salên dirêj yên karkirinê ye. Ji bo beşeke mezin a ciwanan jî, karê domdar, xanî û derfeta avakirina jiyaneke serbixwe êdî tenê bûne hêviyek. Dema ku ev rewş berdewam dibe, daxwaza zêdekirina mûçe û ewlehiya kar digihîje pirsiyareke siyasî: Kî biryarê li ser jiyana xelkê dide û di hember encamên wan biryaran de berpirsiyar e?**

Encamên lêkolînên «Guman» alîkariya me dikin ku em paşxaneya siyasî ya van nerazîbûnan baştir fam bikin. Bo nimûne, di lêkolîna sala 2024an de, nirxandina nifûsa xwendewar a li hundirê Îranê nîşan dida ku nêzîkî heft kes ji her deh kesan li dijî berdewamiya desthilatdariya Komara Îslamî ne.

Lê di nav dijberên rejîmê de jî li ser rêya derbasbûnê û şêweya sîstema siyasî ya pêşerojê tercîhên cuda hene. Li gorî têgihiştina min, cudahiya di navbera daxwaza guhertinê û nebûna lihevkirinekê li ser xala hevbeş ji bo gihîştina wê, yek ji taybetmendiyên diyarker ên rewşa niha ye.

Lê rewşa Kurdistanê hinekî cuda û taybetir e; ji ber ku ezmûna cudakariyê û ewlehîkirina daxwazên zimanî, çandî û siyasî jî bandorê li ser têgihiştina xelkê ji wateya guhertinê dike.

**Piştî tepeserkirina bi xwîn a nerazîbûna meha Befranbara sala borî, gelo tirsa dubarebûna wan tepeserkirinan dikare pêşiya nerazîbûnên nû bigire, yan jî nerazîbûnên ku li ser hev kom bûne hê jî hêza vegera civakê bo ser şeqaman di xwe de diparêzin? Hûn rola xelkê di vê rewşê de çawa dibînin?**

Bêhroz Çemenara: Komkujiya meha Befranbarê asta beşdarbûna gel bilindtir kir; ango kiryarên hevbeş dijwartir kirin. Dema ku kesek xwe di beramberî egera girtin, ji kar derxistin an jî kuştinê de dibîne, di dema biryardanê de li tevgera kesên din jî dinihêre. Dibe ku bi hezaran kes daxwaza xwepêşandanê bikin, lê her yek ji wan bifikire ku yên din dernakevin meydanê. Ji ber vê yekê, ew di beşdarbûnê an jî di pêşengiya kiryareke hevbeş de dudilî nîşan bidin.

Li gorî teoriya kiryarên bikom, ev pirsgirêkeke hevahengiyê ye ku bi navê «baweriya hevbeş» tê naskirin. Biryara her kesî girêdayî wê wêneyê ye ku ew ji amadebûna kesên din re di hişê xwe de çêdike. Hikûmet bi bilindkirina mesrefa xwepêşandanê, rasterast vê yekê dike armanc.

Ji ber vê yekê, dibe ku civakek bi awayekî kûr nerazî be, lê ji bo demeke diyarkirî beşdariya wê ya li ser şeqaman kêm bimîne. Grev, komcivînên pîşeyî an jî dadxwazî û mafxwaziya malbatên qurbaniyan dikarin derfetê bidin xelkê ku careke din bi berfirehî piştgiriya hevdu bibînin.

Di vê xalê de rola xelkê ya xwecihî gelek bi bandor e. Daxwaza derbasbûn ji vê desthilatê dikare kûr û berfireh be, lê amadebûna xelkê ji bo vegera meydanê dema ku ew beşdariya kesên din cidî bigire û bawer bike ku kiryara hevbeş dikare encamê bide, zêdetir dibe.

**«Ne şer, ne aşitî» û westiyana civakî**

**Di şert û mercên ku xelkê Îran û Kurdistanê hevdem bi krîza jiyanê, enflasyon, bêkarî û nebaweriya aborî re rû bi rû ne, û Îran di rewşa «ne şer, ne aşitî» û nezelaliya siyasî û ewlehiyê de ye, ev rewş çi bandorê li ser derûn û tevgera civakî ya xelkê dike? Gelo şiroveya te bo vê mijarê çiye?**

Bêhroz Çemenara: Nediyarbûna dirêjdemî asoyên hêviya jiyanê teng dike. Kesê ku her roj neçar e ji bo dayîna kirê, peydakirina derman an jî parastina karê xwe çareseriyekê bibîne, dem û hêza wî ji bo şopandina daxwazên giştî kêmtir dibe.

Ji bo ciwanan, nemana hêviyê bi pêşerojê wateya wê ye ku biryarên wekî berdewamiya xwendinê, ketina nav bazara karê an jî avakirina malbatê her tim paşde tên avêtin. Givaşên aborî û jiyanî ji aliyekî ve nerazîbûnê zêde dikin, lê ji aliyê din ve çavkaniyên hewce ji bo beşdarbûnê—ji dem û dahatê bigire heta hêza tehemûlkirina hezîneyên jiyanê—ji xelkê distînin.

Li baweriya min, hikûmet berdewamiya rewşa şerî ya li hundirê Îranê wekî berjewendiyeke siyasî dibîne. Bi vegerandina domdar a gefên biyanî û derve, dikare grev û komcivînan bike mijareke ewlehiyê, bersivdayînê paş bixe û ji xelkê bixwaze ku daxwazên xwe ji bo demekê rawestînin. Bi dawîhatina rewşa awarte, hikûmet rasterasttir dikeve ber daxwazên aborî û siyasî yên civakê.

Dorpêçên niha yên Amerîkayê ku di çend mehên dawî de derketine holê, givaşên nû dixin ser jiyana xelkê; xelkê ku bi dehan sal e di bin givaşên dorpêçan û givaşên navxweyî de maye.

Lê givaşên navxweyî xwedî dîrokeke 47 salî ne. Komara Îslamî di vê heyamê de gelek caran, bi navên şer, ewlehî an jî berjewendiya rejîmê, ji xelkê xwestiye ku baca biryarên ku di standina wan de tu rolekî nebûye, bide.

**Kurdistan: navendeke bihêz a siyasî û civakî**

**Çima li Kurdistanê, heta daxwazên sendîkayî û komcivînên nerazîbûnê yên ji bo bijêwiya jiyanê jî, pir caran bi reftara tund a hêzên rejîmê re rû bi rû dimînin? Herwisa, gelek caran hatiye dîtin ku ji aliyê navendên ewlehiyê yên rejîmê ve ji xelkê re dosiyên ewlehiyê tên vekirin, an jî beşek ji mamoste, pizîşk û xwendekaran heta ji kar û xwendinê jî tên dûrxistin. Ev cudahiya reftarê ya li Kurdistanê çi nîşan dide?**

Bêhroz Çemenara: Li gorî min, Kurdistan di pêwendiyên hêzê de li Îranê ne tenê derdor an jî herêmeke paşxistî ye. Kurdistan bi xwe navendeke bihêz a siyasî û civakî ye û Tehran jî wê wekî dijberekî cidî dibîne.

Ev giraniya siyasî ji têkiliya di navbera yekîtî û hevgirtina nasnameyî, dîroka rêxistinkirina partiyan û serpêhatiya çalakiyên serbixwe yên sivîl û pîşeyî tê. Beşdariya berbiçav a mamosteyên Kurd di tevgera pîşeyî ya mamosteyên Îranê de û para giran a ku Kurd di girtin û îdamên siyasî û îdeolojîk de pêk aniye, her du aliyên van pêwendiyan nîşan didin. Civaka Kurd xwedî şiyana rêxistinkirinê ye û hikûmet jî ji bo kontrolkirin û sînordarkirina wê, bacên giran dixe ser xelkê.

Tehran ji berê ve Kurdistan wekî navendeke potansiyela serhildanê pênase kiriye. Ji ber vê yekê, heta komcivînek ji bo mûçe an ewlehiya kar jî ji vê pencerê ve dinêre ku kî dikare xelkê li dora xwe kom bike û ev pêwendî heta ku dikare berdewam bike.

Di rewşeke wiha de, tepeserkirina ewlehiyê berî ku daxwazeke pîşeyî bibe daxwazeke siyasî dest pê dike. Dosiyesazî û sûcdarkirinên derewîn, ji kar derxistina mamosteyan, qedexekirina xwendina xwendekaran an jî zextkirina pizîşkan, di heman demê de ji kesên din re jî peyamekê dişînin: ku rêxistinkirina serbixwe dikare bi bihayê ji destdana kar û xwendinê biqede.

Ji bo hikûmetê, mijara herî hesas ew hêza civaka Kurdistanê ye ku daxwazên xwe bi xwe diyar bike, ji bo şopandina wan rêxistinê ava bike û bi dengê xwe biaxive.

**Ji nerazîbûna qetiyayî heta kiryara hevbeş**

**Bi berçavgirtina berdewamiya nerazîbûnên sendîkayî, astengên herî girîng ên veguherandina wan nerazîbûnan bo tevgereke hemûalî û giştî çi ne? Rola rêxistinên serbixwe yên karkeran, torên civakî û sivîl, zanîngeh û hevdengiya di navbera komên civakî de, di derbasbûna ji nerazîbûnên ku ji hev qetiyane bo tevgereke civakî ya domdar de çi ye?**

Bêhroz Çemenara: Nerazîbûna hevpar tenê wê demê dikare bibe hêzeke domdar ku rêxistinên pîşeyî û karkeran, zanîngeh û torên sivîl bikaribin di navbera van koman de baweriyê ava bikin û nerazîbûnên xwe bikin xwepêşandaneke giştî.

Greva giştî ya li Kurdistanê, ji Bakurê Zagrosê heta Loristanê, nîşan da ku bangewaziya partiyên Kurdî dikare bibe sedema kiryareke hevrêzkirî li qadeke fireh. Girîngiya vê ezmûnê, bi taybetî piştî komkujiya meha Befranbarê, di vê yekê de bû ku xelk di pratîkê de piştgiriya hevdu dît.

Li baweriya min, ev ezmûn dikare derûniya kiryara bikom li Tehranê û bajarên mezin ên din jî xurtir bike. Ji bo nehêlana valahiya di navbera daxwaza guhertina desthilatê û vegera bo ser şeqaman de, pêdivî bi hêzên siyasî û civakî heye ku bawerî û îtîbara xwe di nav civakê de bi dest xistine, bikaribin di navbera pîşe û herêmên cuda de baweriyê ava bikin û di biryardana hevbeş de ji bo xelkê Kurdistanê û komên din roleke rastîn û bandordar bilîzin.

# Analîzek li ser şoreşa «Jin, Jiyan, Azadî» ji nêrîna teoriyên kiryarên giştî



N. Kawe Ahengerî
W. Hesen Mukerem



**Destpêk**

Tevgera «Jin, Jiyan, Azadî» piştî ku Jîna Emînî, keçeke temen 22salî ya xelka bajarê Seqizê, di îlona sala 2022'an a Zayînî de hat kuştin, bi greva giştî ya li Rojhilatê Kurdistanê, li ser bangewaziya partiyên Rojhilatê Kurdistanê û piştre jî bi reaksiyona xwendekarên zanîngehên Tehranê dest pê kir. Herçiqas ev tevger bi çalakiyeke tevahî sivîl, anko grevê, dest pê kir, lê di demeke kurt de bi tundûtûjiyê re rû bi rû ma û bû sedema kuştina dehan kesan, birîndarbûna sedhan kesan û girtina hezaran kesên din.

Di çend mehên borî de, hewldanên cuda ji bo analîzkirina vê tevgerê ji nêrînên cuda ve hatine kirin. Di vê yekê de ku armanca tevgerê pêkanîna guhertinê bû, tu guman tune ye. Lê pirsiyara sereke ya ku di vê çarçoveyê de derdikeve holê, demografî û erdnîgariya tevgerê ye, û girîngtir ji wê jî ev e ku çima ev tevger di asta pratîkî de li seranserê Îranê nebû tevgerêke giştî?

Di vê gotarê de hewl tê dayîn ku şoreşa «Jin, Jiyan, Azadî» ji nêrîna teoriyên kiryarên giştî, di nav de Modela Nasnameya Civakî ya Kiryarên giştî (SIMCA)، Modela Nirxî-Nasnameyî ya Kiryarên giştî (AICAM)، Teoriya Bêparbûna Nisbî (Relative Deprivation Theory) û Teoriya Nasnameya Civakî (SIT) were analîzkirin. Herwisa, di nav vê analîz û berhevdanê de ez ê bi kurtî li ser du mijarên din jî rawestim: mijara serkirdayetiyê û cihê jinê di pergala ramyarî û çandî ya Îraniyan de.

**Teoriya SIMCA (Modela Nasnameya Civakî ya Kiryarên giştî)**

Teoriya SIMCA ji aliyê lêkolînerên wekî Van Zomeren û hevkarên wî ve, di sala 2008'an de, bi gotareke zanistî di qada akademîk de hat pêşkêşkirin. Li gorî ramana van zanayên navborî, kiryara kolektîf anku giştî encama komek faktor û hêzên pêkanîner e ku di avakirina kiryara kolektîf an jî di çêkirina meyla beşdarbûnê de bandorê dikin.

Li gorî Gamson û Klandermans, sê guherbarên derûnî hene ku di pêvajoya pêkhatina kiryara kolektîf de bandorê dikin. Analîza Gamson di destpêka vê pêvajoyê de bala herî zêde ya zanistî kişand ser xwe. Ev sê guherîn ev in: hestkirina neheqiyê, hestkirina hêz û şiyana bandorkirinê û hesta nasnameya civakî (Gamson, 1992; Klandermans, 1997, 2004).

Bi vê yekê, di analîzkirina me ya li ser tevgera «Jin, Jiyan, Azadî» de, armanca me ew kiryara giştî ye ku aliyên derûnî û civaknasî yên tevgerên komî yên armancdar vedikole. Ji bilî vê yekê, ji ber ku armanca vê tevgerê «guhertin» (Change) bû, lewma demografî û erdnîgariya kiryara giştî jî di vê berhevdanê de xwedî girîngiyeke taybet in.

**Van Zomeren derbarê kiryara giştî de dinivîse:**

«Serhev, diyardeya civakî-derûnî ya kiryara giştî wekî her çalakiyeke ku kes wekî endamên komekê ji bo gihîştina armancên giştî, wekî guhertina civakî, pêk tînin, tê pênasekirin.» (Van Zomeren, 2016a)

Bi berçavgirtina vê pênaseya kiryara civakî ya ku Van Zomeren pêşkêş kiriye, em vê yekê wekî bingeh digirin ku gelek berhevdanên têkildarî kiryara giştî an jî bendewariyên ji kiryara giştî di çarçoveya «Tevgera Jin, Jiyan, Azadî» de, ne tenê encama lêkolîneke berawirdî û meydanî ne, lê gelek ji wan nikarin bersiva hewcedariyên îroyîn ên kesên ku dixwazin sedem û awayên pêkhatina kiryara giştî di rewşa niha ya Îranê de baştir fêm bikin, bidin

Pirsgirêk û tevliheviya berhevdana têkiliya di navbera «kiryara giştî» û «Tevgera Jin, Jiyan, Azadî» de vedigere ser sê hêman an guhertinên bandorker di pêkhatina kiryara giştî de li seranserê Îranê. Bo mînak, beşdarbûn wekî encama kiryara giştî dikare xwedî bingeh û derfetên cuda be. Hin faktorên teşwîqker jî dikarin li herêmekê, ji ber taybetmendiyên civakî-çandî yên wê herêmê, heman encam û kiryara giştî çê bikin, lê li herêmeke din bi heman awayî û di heman astê de bandorê nekin.

«Derûniya beşdarbûna sivîl wekî kiryareke giştî, pêvajoyeke tevlihev û piralî ye… Ev derûnî hesabkirina lêçûn û berjewendiyan, nasnameya komî, hest û exlaq wekî aliyên girîng û bi hev ve girêdayî nîşan dide. Di dema krîzekê de ku beşdarbûna sivîl pêdivî dike, hemû ev mekanîzmayên derûnî yên cuda dikarin werin xebitandin.»

**(Van Zomeren, M., Postmes, T., Spears, R., 2012)**

Ji ber vê yekê, eger em dixwazin bersiva sedemên pêkhatina kiryara giştî an jî nebûna wê di têkiliya bi demografî û erdnîgariya şoreşa «Jin, Jiyan, Azadî» re bidin, divê em li gorî taybetmendiyên erdnîgarî, demografîk û civakî-çandî yên gelên Îranê, lêkolîneke kûrtir û meydanî li ser hêmanên bandorker ên pêkhatina kiryara giştî bikin.

Van Zomeren û hevkarên wî di çarçoveya teoriya SIMCA de, piştî vekolîna 182 lêkolînên zanistî yên têkildarî sê hêmanên bingehîn ên vê teoriyê, anko hestkirina neheqiyê, karîgeriyê û nasnameya civakî, gihîştine vê encamê ku her sê hêman, ji hev cuda, bandoreke navîn û sedemî li ser kiryara giştî dikin.

**Herwisa, encamên wan girîngiya nasnameya civakî di pêşbîniya kiryara giştî de piştrast dikin û piştgiriyê didin pêşbîniyên sereke yên SIMCA:**

**A -** Neheqiya ku bi awayekî hestyarî tê hîskirin û nasnameya siyasîkirî, li gorî neheqiya bê hest û nasnameya nesiyasîkirî, bandoreke bihêztir çêdikin.

**B -** Nasname, kiryara giştî li hemberî ziyanên tesadufî û yên avahîsaziyê pêşbînî dike, lê neheqî û karîgerî, kiryara giştî li hemberî ziyanên tesadufî ji aliyê pêşbîniyê ve çêtir diyar dikin.

**C -** Her sê faktorên pêşbînîker, dema ku tê kontrolkirin, bandoreke navîn û taybet li ser kiryara giştî çêdikin.

**D -** Nasname di navbera neheqiyê û ravekirina karîgeriya kiryara giştî de wekî pirekê tevdigere.

**(Martijn van Zomeren, Tom Postmes, Russell Spears, 2008)**

SIMCA dikare di berhevdana kiryara giştî a gelên Îranê de bibe amrazeke bikêrhatî. Di vê teoriyê de nasnameya civakî xwedî roleke navendî ye, ji ber ku, li gorî Van Zomeren û hevkarên wî, nasname rasterast rola aktorên civakî ji bo beşdarbûna di kiryareke kolektîf anku giştî de zêde dike. Di heman demê de, ev nasname di ravekirina neheqiyê û karîgeriya kiryara giştî de jî rolekê dilîze.

# Dema ku kêmbûna avê dibe mijareke berpirsiyariya siyasî û dadmendiya civakî



N. Sefiye Xalidî



Rojhilatê Kurdistanê bi krîzeke ekolojîk a giran re rû bi rû ye, ku encamên wê ji jîngehê wêdetir diçin û rasterast bandorê li jiyana rojane ya nifûsê dikin. Kêmbûna avê, qirêjî û pîsiya jîngehê, wêrankirina jîngehên xwezayî û binesaziya nebaş di nav pirsgirêkên sereke yên herêmê de ne.

Her çend ev di nihêrîna pêşîn de wekî encamek guherîna avhewayê xuya bike jî, ew di heman demê de xuyangek pirsgirêkên avahîsaziyê, têkçûnên siyasî û polîtîkayek pêşkeftinê ye ku têra xwe girîngiyê nade parastina çavkaniyên xwezayî.

Li gelek deverên Rojhilatê Kurdistanê, mirov ji ziwabûna zêde, kêmbûna rezervên avê û encamên rêveberiya nedomdar a avê êş dikişînin. Erdên çandiniyê zuha dibin, çavkaniyên avê yên kevneşopî şêniya xwe winda dikin û, di encamê de, gelek malbat bi zehmetiyên aborî re rû bi rû ne.

Civakên gundan, ku nan û pêjîv û risqê wan rasterast bi çandinî û çavkaniyên xwezayî ve girêdayî ye, bi taybetî bandor dibin.

Di heman demê de, nebûna tesîsên palavtin û dermankirina ava qirêj, avêtina bermayiyan a nebaş û qirêjiya çavkaniyên avê rewşa ekolojîk hîn xirabtir dike.

Ev bandor ji hêla her kesî ve bi heman rengî nayên hîskirin; pir caran beşên civakî û aborî yên dezavantajkirî yên nifûsê ne ku barê herî giran hildigirin.

Di vê çarçoveyê de, pirsa berpirsiyariya hikûmeta Îranê her ku diçe zêdetir derdikeve pêş. Tevî girîngiya ekolojîk a Rojhilatê Kurdistanê, gelek herêm hîn jî bi kêmasiyên girîng ên binesaziyê û nebûna derfetên pêşkeftinê re rû bi rû ne.

Têkçûna veberhênanê di dabînkirina ava domdar de, çavdêriya nebaş a jîngehê, û beşdariya sînorkirî ya nifûsa herêmî di pêvajoyên biryargirtinê yên sereke de tenê pirsgirêkên heyî girantir dike.

Gel ne tenê mudaxeleyên demkurt, belku çareseriyên demdirêj, plan û polîtîkayên jîngehê yên zelal, û mafê gotina di pêşeroja jîngehên jiyana xwe de hewce dike. Krîza jîngehê nikare ji pirsgirêkên siyasî û civakî veqetandî were dîtin.

Aliyekî bi taybetî pirsgirêkdar, ew awaye ku tê de wêrankirina ekolojîk û newekheviya civakî bi hev ve girêdayî ne. Dema ku mirov nikarin bi awayekî pêbawer bigihîjin ava paqij, dema ku derfetên debara çandiniyê ji dest diçin û dema ku pêşeroja aborî kêm dibe, koçkirin û bicî hêlana zêd û cihwaran pir caran dibe tenê vebijarka ku dimîne.

Bi taybetî ciwan, her ku diçe zêdetir bi wê pirsê re rûbirû dimînin ka gelo ew dikarin li welatê xwe pêşerojekê ava bikin an na. Di encamê de, herêm ne tenê çavkaniyên xwe yên xwezayî, belku herwisa beşek ji pêşeroja xwe ya civakî û çandî jî winda dike.
Ji ber vê yekê, parastina jîngehê li hemû aliyên Kurdistanê, ji daxwazeke ekolojîk wêdetir e.

Ev mijareke dadmendiya civakî, berpirsiyariya siyasî û beşdariya civakî ye. Ev yek pêdivî bi nirxandinên serbixwe yên jîngehî, veberhênana di pergalên nûjen ên av û kanalîzasyonê de, rêveberiya berpirsiyar a çem û avên bin erdê, û piştgiriya ji bo însiyatîfên jîngehî yên herêmî heye.
Herwisa gelek girîng e ku çalakvanên jîngehê, zanyar û dengên rexnegir bikaribin karê xwe bêyî tirsandin an sînordarkirinên siyasî pêk bînin.
Mafê xelkê Kurdistanê heye ku bigihîjin ava paqij, hawîrdoreke saxlem û pêşerojeke ewle.
Divê ev maf ne girêdayî cihê erdnîgarî an nasnameya wan a etnîkî bin.



Divê hikûmetên dagirker berpirsiyariya xwe ya parastina bingehên xwezayî yên jiyanê ji bo hemû komên gel qebûl bike, rêjîma dagîrker a Îranê ku qet berpirsayetiya kirîza jîngehê û kêmiya avê û saxlemiya xelkê nagre ustiyê xwe, belku ev rêjîm hebxwe sebebkarê çêbûna hemî kirîzane, hebxwe bi avayên cuda jîngehê ji nav dibe, avê diçikîne, yan bi kanalan didize û vediguheze bo deverên din, bi madên kîmiyayî xwezayê pîs dike, Kurdistan weke padigan û meydana şer dibîne û axa Kurdistanê li ber mîn û asin û barûtê bûye axekî netendurist, û bo armancên siyasiye xwe rêjîmê dehan bendav li Kurdistanê de lêdane ku sedan gund û sedan hezar hiktar zewiyên çandiniyê bin avê keftine, û xelkê wan deran neçarî koçberiyê bûne.

Ji ber ku wêrankirina hawîrdorê, qet ne tenê wêrankirina dîmenên xwezayî ye; ew tenduristî, debara aborî û pêşeroja civakekê bi temamî dixe xetereyê.

Lewma, pirsa sereke ne tenê ew e ku xelkê Kurdistanê çawa dikarin hawîrdora xwe biparêzin, belkî ew e jî ku çima divê gel heta roja îro jî ji bo şert û mercên bingehîn ên jiyanê têbikoşe.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Daxwaza lêborîna Navdewletî bo lêpirsîn li tawanên Komara Îslamî




Rêkxirava Lêborîna Navdewletî bi îşarekirin bi berdewamiya tepeserî û kuştara xwepîşanderan li Xezelwera 1398an heya nerizatiyên Befranbara 1404an, daxwaz li kora giştî a Neteweyên Yekgirtî kir û mîkanîzmeke Dadwerî bo lêpirsînê li bikerên cinayet bi dijî mirovahiyê li Îranê pêk bîne.
Li daxûyaniya wê rêkxiravê de hatiye ku parêzbendiya berpirsên Komara Îslamî li siza û lêpirsînê, bûye sedema dubarebûna pêla kuştar û tundûtîjiyê dijî xwepîşanderan, bi awayekî ku sizanedana biryarderan û bikerên şoreşa Jin Jiyan Azadî, li sala 1401an hand daye bo encamdana cinayetên mezintir û kuştara hezaran kes li Befranbara 1404an de.
Ew daxwaz di demekê de ye ku Jan Noêl Baro, Wezîrê Derve ê Feransa, roja Çarşemî 27ê Xezelwerê li parlemana welatê xwe de, tevî derbirîna piştevanî li xebata xelkê Îranê bo azadî, daxwaz kir ku kora giştî a neteweyên Yekgirtî biryarnameyekê pesend bike û tê de tawanên rejîma Îranê wekî, Tawan dijî Mirovahiyê binasîne.
Hevdem Antonî Gotrêş Sikirtêrê Giştî ê Neteweyên Yekgirî jî ragehand ku, rêkxirava wan kuştara xwepîşanderên befranbarê bi temamî şermezar kiriye, lê emraza hewce bo ragirtina binpêkariya mafê mirov li Îranê de li ber dest de nîne.
Lêborîna Navdewletî tekezî ji vê kiriye ku sîstema Dadweriya Komara Îslamî ne daxwaz û ne şiyana lêkolîn li tawanên berpirsên xwe heye, ji berk u civatgeha navdewletî dibe li rêya pêkanîna Mîkanîzma serbixwe dawiyê bi bazneya parêzbendiya tawanbaran bîne.

## Neteweyên Yekbûyî biryarnameya binpêkirina mafên mirovan li Îranê pesend kir



Komîteya Sêyem a Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî, êvara Çarşemê 18ê Çirrya Paşîn a 2026an, hemberî (27ê Xezelwera 1405an), biryarnameyek li ser “Rewşa Mafên Mirovan li Komara Îslamî ya Îranê” bi 76 dengên erê, 27 dengên na û 64 dengên bêalî pesend kir.
Ev biryarname ku her sal bi pêşengiya hikûmeta Kanadayê tê pêşkêşkirin, nîgeraniyên kûr ên civaka navneteweyî li hemberî “binpêkirina berfireh a mafên mirovan li Îranê” tîne ziman. Di naveroka biryarnameyê de bal hatiye kişandin ser mijarên girîng ên wekî zêdebûn û cîbicîkirina cezayên darvekirinê, girtinên xweserane, binpêkirina mafên jinan û herwisa sînordarkirin û cudakariya li dijî kêmîneyên neteweyî û olî.
Qirar e ev biryarname di meha Kanûnê de ji bo dengdana dawî ji Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî re bê şandin.
Di dema dengdanê de, Amerîkayê dengê bêalî da vê biryarnameyê, lê nûnertiya wî welatî li Neteweyên Yekbûyî di daxuyaniyekê de zelal kir ku ev helwest nayê wateya “nermbûna siyasetên Amerîkayê li hemberî Tehranê”.
Nûnerê Amerîkayê Dan Negrea sedema dengê bêalî yê welatê xwe bi wê yekê ve girê da ku li gorî Waşîngtonê, biryarname tevî şermezarkirina reftara hikûmeta Îranê li hemberî xwepêşander û girtiyan, di warê “lêpirsîn û berpirsyarkirina Tehranê” de bi têra xwe tund û biryardar nebûye. Wî di dawiya peyama xwe de bang li cîhanê kir ku rê nedin rejîma Îranê bigihîje çavkaniyên darayî da ku nikaribe zext û tepeserkariyên xwe li dijî xelkê Îranê bidomîne.

## Rêjîma Îranê sizaya bidarvekirinê bi ser sê nerizatiyên din ên Befranbarê de sepand



Sizaya bidarvekirin, girtina hovane û dadgehîkirinên nimayîşî wek emrazekî tirsandin û tepeseriya siyasî, ji aliyê rêjîmê vet ê bikaranîn

Li dirêjeya siyasetên tepeserî û sepandina sizaya mirinê bo dijber û xwepîşanderan, Dezgeha binav Dadweriya Komara Îslamî, sizaya bidarvekirinê bi ser sê girtiyên din yên nerizatiya Befranbara 1404an de sepand.
Li gorî raporta roja Sêşemî 26ê Xezelwerê nûçegihaniya Hêranayê, sê welatiyên nerazî yên bi navên Husên Perwîn, EmîrHusên Xulamşahî û Husên Ceferî ku niha li girtîgeha Qizilhisara Kerecê de hatine ragirtin, li dosiyek hevbeş de ji aliyê taya 23 a Dadgeha Înqilaba Tehranê ve bi tohmeta, encamdana karê kiryarî bo Îsraîlê sizaya bidarvekirinê bi ser wan de hatiye sepandin.
Ew sê kes hevdem ligel nerizatiyên seranserî ên Befranbara 1404an hatibûne girtin û di despêkê de bo girtîgeha Tehranê û piştre li havîna îsal de bo girtîgeha Qizilhisara Kerecê hatine veguhastin.
Heya niha tu zaniyariyek hûr li ser temen, pêşîne, rewta dadgehîkirin û rewşa wan sê girtiyan nehatiye belavkirin.
Sepandina wan sizayan di demekê de ku li gorî amarên rêkxirava Mafê Mirovî a Îranê, heya niha aliyê kêm 121 kes li girtiyên nerizatiya Befranbara 1404an sizasizaya bidarvekirinê bi ser wan derçûye.
Li Reşemeya 1404an heya niha, aliyê kêm 74 girtiyên siyasî û nerazî hatine bidarvekirin ku 39 kes ji wan neraziyên Befranbarê û 2 kes li neraziyên şoreşa Jin Jiyan Azadî yê bûne.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (530)


